**Fragen und Antworten zur Coronaschutzverordnung ab 25. Januar 2021**

**Pirsên li ser Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê yên ji tarîxa 25ê çileyê paşîn ê 2021î pê de di rewacê de be Gelek tên Pirsîn**

**Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê – dê ji 25ê çileyê paşîn pê de bikevin rewacê**

# Di 19ê çileyê paşîn de birêvebirîyên federal û yên eyaletan ne bi tenê tevdîr û fermanên qanûnî dirêj kirin, fermanên nû yên qanûnî jî anîn. Dê li Bakurê Ren-Vestfalyayê kîjan fermanên nû yên qanûnî bikevin rewacê?

Serekên eyaletên federal û Şansulye di tarîxa 19ê çileyê paşîn de hatin rû hev û ji bo li ser dirêjkirina tevdîr û fermanên qanûnî yên dê di nava 11ê çileyê paşîn ê 2021î-14ê sebatê de di rewacê de ne û bitesîrtir têkoşîna bi belavbûna vayrûsê re sitandina tevdîrên pêvekî li hev kirine. Di çarçoveya Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê de fermanên qanûnî yên nû yên li Bakurê Ren-Vestfalyayê dê di tarîxa 25ê çileyê paşîn ê 2021î de bikevin rewacê.

Serekwezîrê Eyaletê Armîn Laschlet, li ser encamên dan û sitandinên di seranserê eyaletê û seranserê federal de bi raya tevayî daye zanîn (video).

# Dê çi sînorkirinên bihevvebûnê di rewacê de bin?

Heta tarîxa 14ê sebatê dê sînorkirinên lê jêrê di rewacê de bin:

Ji bo hevdîtinên li cîhên ji her kesî re vekirî bi tenê tevlî endamên malê û ji kesekî din re destûr tê dayîn. Eger ev kes bivê hinekan bi xwe re xwedî bike, zaroyên ji mala xwe jî dikare li ba xwe bihêle; ji alî heqê wasîbûnê ve dêûbavên ji zaroyê cuda dijîn jî dibin li balê rawestin.

Îstîsnayên li ser pêdivêyên navbera herî kêm bi pirranî wek xwe mane û dibin di fiqreya 2yê ya madeya 2yê ya Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê de bên xwandin. Ev îstîsna, tevlî yên din, ji bo zaroyên li baxçeyên leyîstikê dileyîzin, bi maskeye bikaranîna veguhestina komî, hevaltîya ji yên temenpiçûk yan çavdêrîya wan, ji bilî van ji bo kesên din ên ji wan re xwedîkirin divê jî di rewacê de ne.

# Li ser mijara pêdivêya maskeye tu guhertin hene?

Erê. Ji tarîxa 25ê çileyê paşîn 2021î pê de maskeyên tibbî divê li hin deverên xuyandî bên lixwekirin. Li gora Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê maskeyên tibbî yên xuyandî; maskeyên neştergerîyê ne (divê - EN 14683 – di pakêtê te xuyandî be) yan jî maskeyên bi standardên KN95/N95 yan jî FFP2 re lihevhatî ne. Berpirsîyarîya lixwekirina maskeye tibbî, bêyî guhdayîna navbera herî kêm, dê li van deran di rewacê de be:

- mixazeyên parekende, dermanxane, benzînxane, banke filan û ji bilî van li avahîyên pêkanîna tibbî yan yên wek yan,
- veguhestina komî, îstasyon û rawestîngehên tirênê,
- tevlî cîhên rûniştinê, gava xizmetên dînî yan di gava her cûrê kombûnên dînî de.

Li gora qanûnê federal (SARS-CoV-2 Qaydeyên Ewlehîya Pîşeyî – 20ê çileyê paşîn ê 2021î, Wezîrîya Federal a Karkirinê û Karûbarên Civatî) gava navbera 1,5 mîtroyî neye pêkanîn jî li cîhên karkirinê divê maskeye tibbî bê lixwekirin. Di vê rewşê de dê patron ji peyderkirina maskeye tibbî berpirsîyar be. Di cîhên jêrê de pêdivêya maskeyê hê jî di rewacê de ye, li van deran maskeye paçikî têr dike:

- li cîhên ji her kesî re vekirî, li ser têketinên van deveran çavdêrî bê kirin yan neyê kirin, eger ji bo gihana mişterîyan û serdêran re vekirî be,
- bazar û cîhên li derve yên wek wan ên firoşkarîyê
- ber dikanên parekende û cîhên wan ên parke û rêyên buhurînê,

## Çima maskeyên potikî li hin cîhan êdî têr nayên qebûlkirin?

Hat îsbatkirin ku di gava pandemîyê de girtina rûyî rêzikeke gelek bitesîr e. Maskeyên potikî kêmtir parastî ne. Di çarçoveya potansîyel, nexasim mûtasyonên bişof ên vayrûsê de li gora birêvebirîyên federal û yên eyaletê, maskeyên tibbî (maskeyên wek maskeyên neştergerîyê tên zanîn yan maskeyên li gora standardên KN95/N95 veya FFP2ê) ji maskeyên paçikê bêtir parastinê pêk tînin ji ber ku maskeyên paçikî tu standardeke parzûnkirinê pêk naynin. Maneya vê ew e ku bikaranîna wan, ewlehîyê dabîn nake.

Li gora biryara federal û ya eyalete ya tarîxa 19ê çileyê paşîn ê 2021î, li Bakurê Ren-Vestfalyayê maskeyên tibbî; li mixazeyên parekende, li cîhên pêkanîna tibbî û veguhestina komî (tevlî îstasyonên tirênê û rawestingehan) ji 25ê çileyê paşîn ê 2021î ve divên bi kar bên. Ji bilî van, ev, tevlî cîhên rûniştinê jî, gava xizmetên dînî yan her cûrê kombûnên dînî jî di rewacê de ye.

## Maskeyên tibbî çi ne û em dikarin wan çawa nas bikin?

Di nava maskeyên tibbî de maskeyên wek FFP2/FFP3 (bê valf) û yên wek wan, wek nimûne maskeyên parastinê yên bîhnê yên ji bo pandemîya koronavayrûsê (maskeyên CPA wek nmn. KN95/N95) hene. Dibe we li nexweşxaneyan û çavdêrîxaneyan maskeyên neştergerîyê dîtibin. Ji alavên sentetîk çêkirî ne û çargoşeyî ne, tevnên wan ên xwaromaro hene, gelekê caran renge wan kesk yan hêşîn in. Ev maske li gora standarda DIN EN 14683 ne û ji bo maskeyên tibbî yên serçavan lihevhatî ne. Maskeyên FFP2 (li gora standardên DIN EN 149an tên berhemanîn) gelekê caran pirqatî ne ji hirîya nûjêkirî tê çêkirin û wek nukulê ne.

Taybetîyên maskeyên FFP2 (û maskeyên wisa yên CPA) di broşura MAGSê ya zanyarîya nûkirî hatiye rêzkirin. Maskeyên OP û yên FFP2 wek alavên tibbî û yên parêzkar ên kesî, berî li Ewropayê bên firotina, divên li gora qanûnan di prosedureke bihevxistî re bibuhurin. Herweha di hemûyan de pêzanîna berhemênerî, nasnaya modêla xweser, etîketa CE hene û berhemêner dide zanîn ku vê pêdivêya ewlehîyê ya Ewropayê pêk tîne. Di maskeyên neştergerîyê de ev danzanîn di şûna maskeye de dibin di pakêtê de bin.

## Gelo ji bo zarokan pêdivêya maskeye heye?

Zarokên hê dest bi xwandingehê nekiribin ji pêdivêya maskeyan serbest in. Tevlî cîhên ku maskeye tibbî li wan bivênevê ne, gava maskeyên tibbî li zaroyan baş neyên, maskeyê potikî têr dike.

## Bikaranîna malê-nivîsîngehê mecbûrî ye?

Wezîrîya Federal fermaneke qanûnî ya ku divê di her rewşê de patron ji rêncberan de divên destûra karkirina ji malê bidin buhurand (SARS-CoV-2, Qaydeyên Ewlehîya Pîşeyî – 20ê çileyê paşîn ê 2021, Wezîrîya Federal a Karkirinê û Karûbarên Civatî, 20ê çileyê paşîn ê 2021). Mebesta ji vê ew e ku gava çûn û hatina karkirinê pêvebûna fizîkî bê kêmkirin. Ev qayde dê piştî gaveke kin bikeve rewacê.

## Fermanên qanûnî yên ji bo xizmeta xurekîyê û bicîhbûna şevînîyê çi ne?

Xwarinfiroş û cîhên kêfkirinê yên ji her kesî re vekirî dê girtî bin. Ev ji bilî van ji bo kantînan û xwaringehan jî di rewacê de ye.

Bi tenê ji wergirtinê û wergirtina gava derbasbûnê re destûr tê dayîn. Xwaringehên li kantînên şîrketan dezgehên hînkarîyê, eger bên girtin astengî ji xizmeta hînkarîyê ya destûrdayî û proseya wan a karkirina her carê re derkeve, wê gavê dibin ji bo xizmetkirina ji bikarênerên dezgehên hînkarîyê û rêncberên wan re vekirî bimînin.

Bicîhbûnên şevînî yên bi mebesta taybet hatiye qedexekirin. Bicîhbûnên bi mebestên karî/fermî ji vê serbest in.

## Gelo dê dinanên parekendeyê girtî bimînin?

Erê. Heta 14ê sebatê dê dikanên parekendeyê girtî bimînin. Ev awa ji bo van di rewacê de nîne: dikanên beqalîyeyê, xizmetên sitandina di gava buhurînê û wergirtinê de, dikanên vexwarinan, bazarên cotkaran, dermanxane, mexazeyên xwurekîya saxlemîyê, dikanên tibî, dikanên berhemên bebekan, kimyager, benzînxane, banke, kooperatîfên krêdîyê, nivîsîngehên posteyê, büfe û standên firotina rojnameyan, dikanên êmê û dikanên ji bo pêdivêyên gîyaneweran, liserhevfiroşên xizmeta mişterîyên liserhevfiroşan dikin û xizmetên xurekîyê yên xizmetên civatî (wek bankeya xurekîyê) ew pêk tînin.

## Destûr heye bi rêya posteyê tişt bên xwastin û gava mişterî bibuhurin berheman bistînin?

Erê. Destûra karên bi rêya posteyê xwastî û teslîmkirina gava buhurînê heye. Ji gava buhurînê sitandina berheman re, bi tenê eger bê pêvebûn karibe bê pêkanîn û tevdîrên astengkirina enfeksîyonê pêk bên destûr tê dayîn.

## Gelo dê destûra vebûna marketên avakarîyê bê dayîn?

Ji marketên avakarîyê û baxçeyan re, bi tenê ji bo xizmetkirina wan a ji tevgerên bazirganîyê re destûr tê dayîn. Dê kesên din nikaribin bikevin wan.

## Fermanên qanûnî yên ji bo xwandingehan hatî çi ne?

Hînkirina rû bi rû heta tarîxa 14ê sebata 2021î hatiye rawestandin.

Ji roja duşema 1ê çileyê paşîn ê 2021î pê de ji bo hemû teng û sinifan hînkarî li ser torê tê kirin. Ev fermana qanûnî ji bo sinifên qedandinê jî di rewacê de ne.

Hûn dikarin ji vê sîteyê xwe bigihînên zanyarîyên bi hûrgilî yên li ser koronavayrûsê û xwandingehan: [Sîteya înternetê ya Wezîrîya Hînkarîyê û Xwandingehan].

## Eger dêûbav nikaribin pêk bînin, dê li xwandingehan xizmeta xwedîkirina zaroyan a rojanî hebe?

Erê. Lê eger mumkin be tê xwastin hemû dêûbav li malê zaroyên xwe xwedî bikin û bi vî awayî çarçoveya pêvebûna fizîkî bê kêmkirin.

Di heman demê de ji 11ê çileyê paşîn ê 2021î pê de hemû xwandingeh ji bo xwandinkarên ji bo zaroyên rewşa wan xeter e yan nabe li malê bên xwedîkirin ên nava sinifa 1î – sinifa 6an xizmeta xwedîkirinê dike.

Li xwandingehên taybet yan ên dewletê xwandinkarên ku pêdivêya wan bi xwedîkirina yan hînbûna taybet heye (wek nimûne bipêşveçûnên pêdivêyên hişî, fizîkî, yan motor) jî di nav wan de ne ev divên bi hevkarîya bi dêûbavan yan wasîyan re bên birêvebirin.

# Fermanên qanûnî yên ji bo navendên xwedîkirina rojanî hatî ne çi ne?

Di nava 11ê çileyê paşîn ê 2021î û 14ê sebata 2021î de ev di rewacê de ne:

Dabînkirina xwedîkirina rojanî dewam dike, lê hîvî ji dêûbavan ew e ku ew bixwe zaroyên xwe xwedî bikin. Qedexeyîya têketinê tune ye. Zaroyên ku ji dil ji wan re xwedîkirin divê dikarin dewam bikin. Ji ber ku ji rewşa vêga ya pandemîya koronavayrûsê re komên sabit divên, di nava malbat û avahîyan de çarçoveya xwedîkirina li serê lihevkirî dê bê daxistin 10 saetan (eger 45 be 35, 35 be 25, 25 be 15 saetan). Li navendên xwedîkirina zaroyan ên xwedanên bername û rêncberên sabit dê çarçoveya xwedîkirinê wek xwe bimîne.

Eger ji dêûbavan re pêdivêya xwedîkirina zaroyan bivê ew ê vê alîkarîyê wergirin. Ev ji bo sebebên profesyonel, bi malbatê re têkildar yan bi zaroyan ve têkildar heye.

Divê nevê hîç zaroyek ji ber karantînayê ziyanê bibine. Dêûbav divên bi navendên xwedîkirina rojanî yan xwedîkirên zaroyên xwe re têkilîyeke li ser hîmê ewlehîyê pêk bînin.

# Gelo dê xizmetên heyî yên xwedîkirina rojanî bi tenê ji bo dêûbavên xwedanên pîşeyên hesas lihevhatî be?

Na. Xwedîkirina rojanî bi tenê ji bo hemû zaroyên bera bi pêdivî ne heye.

# Dê unîversîte û xizmetên hînkarîya hiqûqê tevahîya gelî yên derveyê mufredatê vekirî bimînin?

Bi şertê ku pêdivêyên Qanûnê Parastina ji Enfeksîyonê pêk bên, destûr ji hînkarî û azmûnên Unîversîteyan û xwandingehên tibê re tê dayîn.

Eger ders ne welê bin ku bên karîn li ser torê bên dayîn yan bêyî ziyan bê dayîn xwandinkaran bi paş ve bên avêtin, dikarin rû bi rû bên dayîn.

Yüz yüze sınavlara ve hazırlıklara sadece, eğer zorunlu sebeplerle ertelenemeyeceklerse veya sınavı alan öğrencilerin yerini değiştirmek mümkün değilse izin verilmektedir.

Ji azmûnên rû bi rû û amadeyîyan re bi tenê eger nikaribin ji ber sebebên bivênevê bên bipaşveavêtin yan guherandina cîhê xwandinkarên dikevin azmûnê mumkin nînbe destûr tê dayîn.

# Dê ji avahîyên kulturê çi bibe?

Li tîyatro, opera, eywanên konsere, sînema û avahîyên din ên ji tevahîyê re vekirî yan taybet (kulturî) pêkanîna konsertan yan nîşandayînan heta 14ê sebata 2021î hatiye qedexekirin. Ev ji

bilî van ji bo muzeyan, pêşandanên hunerî, galerîyan, koşkan, kelehan, abîdeyan û avahîyên wek wan jî di rewacê de ye.

Bi tenê bi şertê ku di nava tirimpêlan de navbereke 1,5 mîtroyî hebe dê destûr ji sînemayên bi tirimpêl re bê dayîn.

# Bihevxistinên di rewacê de ji bo muzîkjenên profesyonel çi ne?

Destûr ji provayên bi mebestên profesyonel in re tê dayîn. Destûr tê dayîn muzîkjenên profesyonel li ser radyo û înternetê weşanên xwe yên konsert û performansan bêyî temaşegeran belav bikin.

# Bihevxistinên bi mebesta kêfkirinê û sîporên amator çi ne?

Sîporên bi mebesta kêfkirinê û amator ên di hemû avahîyên tevahî û yên taybet ên sîporê, eywanên cîmnastîkê, hewzên soberîyê û avahîyên wek wan de tên kirin, wek di biharê de çawa bû, dîsa qedexekirî ne. Ev ji bilî van ji bo avahîyên/klabên wek ên tenîsê û golfê jî di rewacê de ne. Bi şertê ku pêdivêyên navberê bên pêkanîn, birêveçûn, bazdana bi tempo filan hê jî destûrdayî ne.

# Rewşa avahîyên bîhnvedanê çawan e?

Heta tarîxa 14ê sebata 2021î bizavên li jêrê hatine qedexekirin: hewzên avjenîyê û yên ji tevahî re vekirî, eywanên reşbûnê, avgerm, germav û avahîyên wek wan, baxçeyên gîyaneweran, parkên kêfkirinê, deverên hundirî yên leyîstikan û avahîyên bêhnvedanê (cîhên hundirî û cîhên derveyî) yên wek wan, eywanên qumarxê û avahîyên wek wan, klab û avahîyên wek wan,

- kerxane, cîhên rêncberîya cinsî û avahîyên wek wan,
- geştên bi keştî, vagon, tirênên kevnar û yên wek wan.

Li firoşkarên ganyanê û şertê bi tenê ji erêkirina bilêtan filan re tê erêkirin. Qedexe ye ku serdêr li van avahîyan bêtir zemanê xwe bibuhurînin (wek nimûne bidûketina bizavên li ser şertê û leyîstikan).

# Ji bizavan û kombûnan re destûr tê dayîn?

Bizav û kombûnên di çarçoveya fermanên taybet ên qanûnî yên Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê de nînin heta tarîxa 14ê çileyê paşîn ê 2021î hatine qedexekirin.

Tevlî yên din, ji her rewşê re bi destûreke cuda destûr tê dayîn:

- kombûnên li gora Qanûnê Kombana Xelqê ne (nmn. Lidarxistina xwenîşandayînan)
- bizavên bi mebesta ji bo ji xelqê re pêşkêşkirina xizmetên hîmî, bizavên xizmetê ji asayîşa tevahî û birêkûpêkîyê yan xizmeta gelî re dikin (wek nimûne bexşînên xwîynê yan kombûnên partîyên ên bi mebesta namzedên herêma hilbijartinê ne) û bizavên ji ber sebebên ḥiqûqî û diyar nikaribin bên bipaşveavêtin heta 14ê sebata 2021î
- kombûnên endamên bi awayê qanûnên diyarkirî, şîrketan, partîyan, yekbûnan yan komeleyên xwedîyên xanîyan ên nabin li ser torê bên pêkanîn
- cenaze
- mehrkirinên belediyeyan

- xizmetên dînî

## Fermanên qanûnî yên ji bo xizmetên dînî û kombûnên din ên dînî di rewacê de ne çi ne?

Dêr û kom divên li gora qaydeyên herêmî yên pandemîyê biryar bidin ka kîjan kombûn bi mebestên dînî rû bi rû pêk bên û bi meqamên têkildar bidin zanîn. Pêdivêya navbera herî kêm pêk bînin, jimara tevlîbûyîyan bi sînor bikin, gava bivênevêyîya buhurîna ji kapasîteya avahîyê hebe ji bo kombûnan pêdivêya qeydê pêk bînin, tevlîbûyîyan tevlî cîhên rûniştî jî di nav de mecbûr bikin ku maskeyên tibî li xwe bikin (maskeyên neştergerîyê yan jî maskeyên li gora standardên KN95/N95 yan FFP2 bin), zanyarîyên têkilîkirina bi serdêran re qeyd bikin û nehêlin bi awayê komî sitran bên gotin.

Li gora fîqreya 3yan a madeya 1î ya Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê, bi mebesta xizmetên dînî û kombûnên din ên dînî, fermanên qanûnî yên ji alî Dêran û komên dînî ve ve bên lidarxistin divên ji alî dêran û endamên birêvebir ên komên din ên dînî ve bên şandin vî meqamî: Şansulyeyîya Eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê.

- BI TENÊ ENDAMÊN BIRÊVEBIR ÊN DIN ÊN DÊRAN Û KOMÊN DÎNÎ dikarin ji vê navnîşanê re e-name bişînin: Referat_I_B3@stk.nrw.de.
- Komên bi dêrekê yan endama din a birêvebir ve girêdayî nînin, dikarin bi belediyeya têkildar re têkilî bikin.

Komên ku yên dêrekê yan endama birêvebir bin di çarçoveya dêra têkildar yan endama birêvebir de divên konseptên ewlehîyê bi rê ve bibin.

## Ma li ser Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê pirseke we ya din heye?

Hûn dikarin e-nameyekê bişînin vê navnîşanê: corona@nrw.de.